Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1218 | 3-Mijdar-2024 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# ‘Şopa Orkîd li her derê tê xuyakirin û winda nabe’

**Reşo Mihemed/ Qamişlo**

**Rêveberê tîma Orkîd Samir Kalo diyar kir ku bi silogana ‘Şopa Orkîd li her derê tê xuyakirin û winda nabe’ ji 14 kesan tîmek bi navê Orkîs hate avakirin. Herwiha Kalo da zanîn ku vê tîmê di demeke kurt de li ser dîwarên bajarê Qamişlo û gelek bajarên kantona Cizîrê wêne xêz kirin û hejmara endamên wê bûn 100 ciwanên xwebexş.**



Tîma Orkîd li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê yek ji girûpên hunerî ya nûjen e. Ev tîm bi rîşa wênesaziyê li ser dîwarên kolanan, tabloyên taybet û her devera ku cihê wênesaziyê lê guncav be, muhra xwe ya hunerî dihêle. Her wiha girêdayî avabûn, kar û xebata tîma Orkîd rêvebirê wê, wênesazê kurd Samir Kalo ji rojnameya me re axivî.

**Avabûn û armanca tîma Orkîd**

Samir Kalo têkildarî avabûna tîma Orkîd wiha got: “Tîma Orkîd di encama lidarxistina Pêşangeha Qêrîna Çav, di 19’ê Gulana 2023’an de li Qamişlo ji 14 kesan hat avakirin. Gelek zarok û kesên mezin di vê pêşangehê de bi wêneyên xwe beşdar bûn. Bi serpereştiya min ev pêşangeh hat lidarxistin. Piştî ku erdheja 6’ê Sibata 2023’an rû da, gelek wênsaz bi temen biçûk û wekî din, xwestin êşa zarokên erdhejê bi riya wêneyan bînin ser ziman. Lewma jî min xwest tîmekê bi navê Orkîd ava bikim. Armanc ji avakirina wê ew bû ku bi awayekî hunerî çand, bawerî û her tiştekî girêdayî gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê wêneyan xêz bikin. Kesên ku di vê tîmê de cihê xwe digirin, piraniya xwe kurd in, lê tîma Orkîd hemû pêkhateyan dixe hembêza xwe. Orkîd navê guleke çiyayî ye, ji taybetmendiyên wê ew e ku dema mirov destê xwe dide wê, şopa dest dimîne. Bi silogana ‘Şopa Orkîd li her derê tê xuyakirin û winda nabe’ me dest bi xebata wênesaziyê kir.

**Xebata hunerî**

Kalo di derbarê xebata wênesaziyê û perwerdekirina endamên tîma Orkîd de wiha anî ser ziman: “Di destpêka avabûna tîma Orkîd de, me insiyatîfeke hunerî li Navenda Fereh a bajarê Girkê Legê û 2 insiyatîfên din li Qamişlo çêkirin. Di van insiyatîfan de zêdayî 9 tabloyên hunerî hatin xêzkirin. Yek ji van tabloyan jî, tabloya pinpinîk bi şêweyekî mezin li Qamişlo hat xêzkirin. Bi van insiyatîfan tîma Orkîd hat naskirin, civakê gelekî ji kar û xebata me ya hunerî hez kir. Her wiha li ser sosiyal mediya jî em hatin naskirin, me dît ku bi awayekî erînî karê me dihat nirxandin, ev yek jî hişt ku hanedan û vîneke xurt li cem me ava bibe da ku em xebata xwe bidomînin. Me li ser asta Qamişlo dest bi xêzkirina wêneyên li ser dîwaran kir, di roja îro de 80 wêne hatine xêzkirin. Li bajarên weke Dêrik, Tirbespî, Girkê Legê û hwd… jî hin tablo hatin  çêkirin lê ne bi qasî hejmara wêneyên Qamişlo, ev yek jî ji ber kêmderfetiyê bû. Tabloyên ku li ser dîwaran hatin xêzkirin mezin bûn, mijarên wan li ser Cejina Newrozê, Roja Jinê, Meha Remezanê, Buhara herêma me û hwd… bûn. Em weke tîma Orkîd dixwazin ku çanda gelên xwe bi hemû pêkhateyan bi rengekî hunerî bidin nîşandan. Wêneyê herî dawîn ê ku me li taxa Xerbî ya Qamişlo çêkir, li ser asta Sûriyê mezintirîn wêne ye. Ev wêne li ser dîwarê avahiyeke çarqat bi rûbera 352 mitreyan girêdayî aşîtiya cîhanî hat xêzkirin.

Samir kalo di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: “Li aliyekî din jî tabloyên normal ên ku ji aliyê wênesazan ve tên çêkirin jîwarî û rasteqînî ne, bi gotineke din ew li ser rêbazê dibistana rasteqînî, wêneyan xêz dikin. Her wiha wêneyên mirovan, xweza û hwd… bi rengê portira tên xêzkirin. Herî dawî jî xebata me ya hunerî ku li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê çêbû, lidarxistina Pêşangeha Çîrokan Serkeftinê ya li Qamişlo bû. Ez û endamên tîma Orkîd bi vê pêşangehê rabûn tê de 110 tablo hatin pêşandan û ji wan tenê 17 hatin firotin, armanc jê ne qezenckirina pereyan bû, lê belê destekdayîna zarokên nexwş bû. Li pêşiya me xebateke berfireh heye, ez dixwazim ku perwerdeyeke mezin bi asta siyem ji şagirtên tîma Orkîd bidim destpêkirin. Her wiha têkiliyên min bi hin rêxistinên derve re hene ku wênesazên tîma Orkîd di pêşangehên cîhanî yên wênesaziyê de beşdar bikim. Li aliyekî din jî em ê di siberojê de li ser dîwarê tax, gund û bajarên her endameke/î tîma Orkîd wêneyekî xêz bikin. Armanc ew e ku civaka wê deverê bizanibe ku şopa Orkîd li wir heye û ew wênesaz jî şanaz be.”



**Astengiya ku derdikeve hember hunera wênesaziyê û banga destekdayîna tîmê**


Samir Kalo girêdayî pirsgirêk û astenengiya ku derdikeve pêşiya hunera wênesaziyê wiha da zelalkirin: “Wênesazên tîma Orkîd di wênesaziyê de afrîner in û di demeke kurt de li ser asta Sûriyê bi giştî hatin naskirin. Ev tîm ji ciwanên Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêk tê û temenê wan ji 8 salî heya 30 salî ye. Tevahiya endamên tîma Orkîd bi dildarî û xwebexş wêneyan xêz dikin. Her wiha hejmara wan 100 wênesaz û şagirtên ku tên fêrkirin. Ez weke wênesaz, li dikana xwe ya biçûk a wênesaziyê, perwerdeyên wênesaziyê didim endamên tîma Orkîd. Ev yek jî dibe astengiyeke herî mezin ji bo xebata me ya hunerî. Mixabin ji ber kêmderfetiyê, perwerde li dikana xwe didim. Em tîmeke hunerî ne, ti alî an jî rêxistin û sazî destekê ji milê madî ve nade me. Lewma jî em nikarin ne navendeke mezin amade bikin û ne jî xebata hunerî bikin. Gelek caran em dixwazin herin bajarên din ji bo xêzkirina wêneyan, ji ber mijara madî em nikarin tiştekî bikin. Em weke tîma Orkîd bang li rêxistin, saziyên çandî û hemû kesên peywendîdar dikin ku desteka madî ji bo me were dayîn. ”

Sudoku: Bersiv 12

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | 2 | 8 | 7 | 9 | 5 | 3 | 6 | 4 |
| 4 | 9 | 3 | 6 | 1 | 8 | 2 | 7 | 5 |
| 6 | 5 | 7 | 3 | 2 | 4 | 1 | 9 | 8 |
| 5 | 3 | 1 | 9 | 8 | 7 | 4 | 2 | 6 |
| 9 | 8 | 2 | 5 | 4 | 6 | 7 | 3 | 1 |
| 7 | 6 | 4 | 1 | 3 | 2 | 8 | 5 | 9 |
| 8 | 1 | 9 | 2 | 6 | 3 | 5 | 4 | 7 |
| 3 | 7 | 6 | 4 | 5 | 1 | 9 | 8 | 2 |
| 2 | 4 | 5 | 8 | 7 | 9 | 6 | 1 | 3 |

Sudoku:Pirs 13

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 9 | 1 | | 7 | | | 5 | 8 | |
| | 5 | | | | 9 | 6 | | 2 |
| | | | 2 | | 8 | | | 9 |
| | | | | | 7 | | | |
| | | 3 | 8 | | 6 | 2 | | |
| | | | 5 | | | | | |
| 6 | | | 9 | | 4 | | | |
| 2 | | 9 | 1 | | | | 7 | |
| | 3 | 7 | | | 2 | | 9 | 1 |




## Luqman Xelîl: QSD’ê gel e, gel jî QSD’ê ye

Endamê Fermandariya QSD’ê Luqman Xelîl diyar kir ku ew ê êrîşên dewleta Tirk ya dagirker bêbersiv nehêlin û di çarçoveya şerê gelê şoreşgerî de amadekariyeke mezin tê kirin. Herwiha Luqman Xelîl bi bîr xist ku êrîşên tên kirin têkbirina aramiya herêmê armanc digire.**R-5**



## Tevlîbûna jina kurd di qada ragihandinê de

Tevgera Azadiya Kurdistanê ku bi pêşengtiya Rêber Abdullah Ocalan destpêkir, di aliyê ragihandina jinê de jî pêşketinek mezin bi xwe re anî. Rêber Apo bi fikrên xwe yên girêdayî rewşa jinê, karî wêneya ku berê ji jinê re hatibû avakirin, biguhere. Ev guherîn bû lêvegerek bingehîn ji lêkolînên jinê di warên ragihandinê de.**R-2**



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1218 | 3-Mijdar-2024 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S


# BERXWEDANA KOBANÊ TÊKOŞÎNA MIROVAHIYÊ LI HEMBERÎ TARÎTIYÊ BÛ

Li hemberî hovîtiya çeteyên DAIŞ û hevkarên wê, şervanên YPG,  YPJ’ê li Kobanê têkoşîneke dîrokî raber kirin. Berxwedana sedsalê, cîhan neçar kir ku ji bo wê rabe ser piyan û piştgiriyê bidiyê. Ev berxwedaniya dîrokî li cîhanê weke berxwedana sedsalê hate naskirin. Lê ev berxwedanî bi berdêlên mezin gihîşt serkeftinê. Herwiha ji tevahiya mirovahiyê re bû serkeftinek û roja 1’ê Mijdarê wekî Roja Piştgiriya Kobanê ya Cîhanî hat ragihandin.**R-4**




## Rêxistina Nûdem: Divê xwedî li kesê astengdar bê derketin

Ji bo alîkariya zarok û kesên astengdar li kantona Efrîn û Şehbayê Rêxistina Nûdem Ya Amedekirin û Geşedanên Mirovî Yên Astengdaran li herêmê hate organîzekirin. berdevka Rêxistinê da zanîn ku astengdara perçeyek ji jiyanê ne û divê xwedî li wan bê derketin. **R-6**



## Kûjerên gelê kurd li Hewlêrê têne pêşwazîkirin

Bi hemdemiya êrîşên dagirkeirya Tirk li ser tevahî gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, hedefgirtina Gerîlayên Azadiyê li Herêmên Parastinê yên Medyayê û kiryarên çeteyan li herêmên dagirkirî; PDK ê rêya xiyanetê doza gelê kurd bi hembêzkirina çeteyên ku kurdan qir dikin, nû dike.**R-3**



## Helîm Yûsiv: Romana kurdî ya nûjen pirreng û pêşketî ye

Romannivîsê kurd Helîm Yûsiv diyar kir ku ji salên 1991 heya 2020’an dikare wekî qonaxa nûjen ya romana kurdî were binavkirin û wiha got: “Romana kurdî di roja îro de mîna romanên zimanên din pirreng û pirşêwe ye. Herwiha li zimanên cîhanê yên sereke têne wergerandin û li her deverê tên naskirin.”**R-7**



**Pêvajoyên Çareseriyê!**
Ahmet Aktaş R-4



**Komar bû koremar**
Hafiz Ahmet Turhalli R-6

# Di qada perwerdê de rola jin bingehîne

Di nava şoreşa Rojava de, jin di tevahiya qadên jiyanê de bûn bingeha serkeftin û pêşketinê. Yek ji qadên ku jinê xwe tê de birêxistin kir û muhra xwe lê da, qada perwerdeyê bû.

**Dîlan Mulhim/Qamişlo**

Di destpêka dîrokê de heta roja îro jin xwedî hezeke û afrîneriyeke cihêreng e, ev hêz û bawerî jî di şoreşa Rojava de xwe da der û pêşket. Herwiha jin li Rojavayê Kurdistanê gelek destkeftiyên girîng bidestxistin. Ev destkeftî mirov dikare bispêre mîrasa têkoşîna dîroka jinê bi sedên salan ku têkoşîn kiriye,da ku bidest bixe. Îro encamê vê têkoşîna ku di pêşxistina rola jinê di nava civakê de xuya dibe, di destpêkirina vejîna birûska 19'ê Tîrmehê û şoreşa Rojavayê Kurdistanê, jinan bare şoreşê girtin li ser milê xwe û di haman demê de bi destpêka şoreşa Rojava re jin di gelek qadan de cihê xwe girt, yek ji van padan jî qada perwerdeyê bû.

Derbarê tevlîbûna jinê di qada perwerdeyê de, rêvebera Desteya Perwerdeyê Semîra Hacî Elî û Rêvebera Dibistana Şerîf al-Redî Botan Hesaf ji rojnameya me re axivîn.


Semîra Hac Alî


Botan Hesaf

Rêvebera Desteya Perwerdeyê Semîra Hacî Elî da zanîn ku jinê di destpêka dîrokê û heta roja îro xwedî hêz û afrîneriyeke cihêrenge û wiha got: "Jin li Rojavayê Kurdistanê tevî hemû şert û mercên ku tê re derbas bûyî, rola xwe ya sereke lîstiye û gelek destkeftiyên girîng bi destxistin. Herwiha jin, ciwan û zarokan perwerde dike, jin ew dayîka ku weke xwedawendekê di nava civakê di hate dîtin. Jin civakê li derdora xwe komdike û perwerde dike. Berhemên jinê yên yekem ku çawa karîbû biafrîne û bike xizmeta civaka xwe de, di heman demê de, di dîrokê de jin ji aliyê desthildarî, olî û kapîtalîzimê ve hatibû şikandin, bi vî awayî jin hate kêmkirin. Lê jinê karê xwe yê perwerdeyê berdewam kir. Jin di malbatê de zarokan perwerde û xwendî dike, jin di malê de dayîk e û li dibistanê mamosteye. Herwiha jin dikar nirxên ku ji dîroka xwe ya xwezayî girtiye û hîn jî di hundirê wê de heye, bike bingeha fikirê netewa dîmokratîk û civake bi sinc. Jin pêşengiya perwerdeyê dike."

**'Jin di her aliyî de pêşeng e'**

Semîra Hacî Elî axaftina wiha qedand: "Jin îro roj pêşengtî û rêveberitiyê dike. Herwiha jin di qada perwerdeyê de ji sedî 80''''''heta 90 cihê xwe girtine. Di haman demê de jin karê xwesertiyê jî dike,jin bi mamosteyan û xwendekaran re dibe alîkar, pirsgirêkên wan çareserdike. Jin di aliyê mamosteyê de rola dayîkbûn di nava civakê dide meşandin û derbasî dibistanan jî dibe. Jin di riya perwerdeyê re civakê avadike, ji ber vê yekê jin di nava civakê de xwedî nirxe. Herwiha jin xwedî zanisteke cuda û berferihe ,di aliyê berferhkirina zanist de asta jinê gelekî li pêşe. di roja me ya îro de jin di gelek pêşketinan de derbas bûye û hîn jî pêşketinên wê berdewamin."

**Kar û xebatên jinê di warê perwerdeyê de**

Rêvebera Dibistana Şerîf Aredî Botan Hisaf anî ser ziman ku jin di gelek waran de cih digire bi tayîbet di warê perwerdeyê de û wiha got: "Di warê perwerdeyê de kesên herî bi kar û xebatan radibe jine û heta roja îro jî kar û xebatên xwe berdewam dike. Hem di warê karê male de jî, hem derûniya zarokan ve têkildare, herwiha xwendekarên dibistanan bêhtir bi mamosteyên jin re têkildarin, di heman demê de mamosteyên jin li kêleka kar û xebatên xwe yên mamostetiyê gelek êş û zehmetiyan dikişînin. Têkiliya di navbera mamoste û xwendekaran de bi taybet di warê perwerdeyê de pir girînge. Ji ber ku rihetî li cemê xwendekaran tunebe nikare têkiliyê bi mamosteyên xwe re bike. Herwiha pêwîste mamosteyên jin di nav perwerdeya dibistanan de rola dayîkbûnê pêk bînin. Ji ber ku hin zarok hene bi pirsgirkên malbatê ve banbor dibin. Ji ber vê yekê mamosteyên jin di warê perwerdeya dibistanan de rola dayîkbûnê pêktînin. Ev tê wateya ku têkiliya di navbera mamosteyên jin û xwendekarên dibistanan de gelekî nêzî hevin weke têkiliya di navbera dayîk û zarokê de ye."

Botan Hisaf axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Pêwîste amûrên perwerdeya dibistanan berdestbin, divê mamoste ji aliyê perwerdeyê ve jî xwedî agahî bin heta ku zarok fêrî jî perwerde bibin. Pêwîste guhertin di biranşên xwendekaran de çêbibin li gorî mêjiyê xwendekaran de ku ev xwendekar asta wan ya xwenidin û perwerdeyê zêde bibe. Herwiha pêwîste ji refê yekem ve zarok fêrî gelek biranşan bibin. Li gorî asta mêjiyê xwendekar, da ku xwendekar ji aliyê perwerdeyê ve pêşbikevin.Herwiha divê zarok fêrî gelek ziman bibe, ne tenê zimanê kurdî ji ber ku civaka me ji gelek ziman pêk tê. Ji ber vê yekê pêwîste zarokên dibistan fêrî zimanê erebî û engilîzî hwd bibin. Daxwaze me ew ku pêdiviyên dibistanan peyda bikin û pirtûk li gorî dema xwe bigihêjin dibistanan."

# Tevlîbûna jina kurd di qada ragihandinê de

**Ayşa Silêman/ Qamişlo**

**Tevgera Azadiya Kurdistanê ku bi pêşengtiya Rêber Abdullah Ocalan destpêkir, di aliyê ragihandina jinê de jî pêşketinek mezin bi xwe re anî. Rêber Apo bi fikrên xwe yên girêdayî rewşa jinê, karî wêneya ku berê ji jinê re hatibû avakirin, biguhere. Ev guherîn bû lêvegerek bingehîn ji lêkolînên jinê di warên ragihandinê de. Jin rolek mezin di warê ragihandinê de dilîze. Bi rêjeya ji sedî 60 derbas dike, tevlî saziyên ragihandinê dibe. Her wiha ajans û kanalên telefizyonê yên taybet bi jinê hene.**

Bi derketina Kovara Dengê Kurdistan re dîrokek nû ya rojnamegeriya Kurd destpê kir. Piştre ji ber siyasetên înkar û qirkirinê tevahiya rojname û kovarên Kurdî hatin girtin. Rojnamegeriya Kurd ji aliyê dagirkerên Kurdistanê ve rastî çewisandinê hat. Ji ber wê rojnamevan neçar man bi awayekî veşartî kar bikin. Di 19'ê Tîrmeha 2012'an de Şoreşa Rojava destpêkir. Şoreşê hişt ku carek din jin rolek çalak û pêşeng bilîze. Dazgehên çapemeniyê yên mîna Ajana Nûçeyan a Hawarê, rojnameya Ronahî, kanala televizyonê ya Ronahî, Kovara Dengê Jiyanê bi Erebî û Kurdî, Asoya Jin, Ajansa Nûçeyan a Jin (JINnews) a taybet bi jinê, derketin. Li kêlek wan jî kovarên giştî mîna Dengê Kurdistan û Rojhilata Navîn a Demokratîk hatin derxistin û di heman demê de radiyo jî hetin vekirin. Heya bigihêje li ser înternetê malperên taybet ên jinê jî vebûn. Li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê di astek bilind de jin beşdarî saziyên ragihandinê bûn. Loma pêwîstî hebû ku rêxistinek hebe da ku van xebatan kom bike, were avakirin. Ji ber wê di 30'ê Nîsana 2014'an, li Qamişlo kongreyek hat lidarxistin. Zêdetirî 50 rojnamevanên jin beşdar bûn û di kongreyê de RAJIN hat avakirin. Da ku bibe sîwanek ji tevahiya rojnamevanên jin re.

**Li tevahî axa Kurdistanê şerê li dijî azadiya ragihandinê**

Li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê rojnameya Azadiya Welat di sala 1992`yan de li gel derketina rojnameyên Welatê Me, Welat û gelek dezgehên din derket. Desthilatdariya Tirkiyê heta niha gelek ji wan rojname û dezgeh qedexe kirine û gelek caran ajansa jin girtin. saziyên herî zêde rastî êrişan tên, saziyên ragihandina azad in. Ji ber ku li Tirkiyê ragihandina azad hewl dide rastiya zilm û zordestiya li dijî gelan tê meşandin, eşkere bike. Dewleta Tirk di sala 2016`an de derbeyek leşkerî da çêkirin û bi vê boneyê siyaseta çewisandinê da meşandin. Herî zêde Kurdan par ji vê siyasetê girt û di serî de ragihandin hat hedefgirtin. Her wiha dewleta Tirk a dagirker gelek saziyên ragihandinê yên Kurdî û ajansên jinê Jinha hedef



girtin. Jinha dev ji karê xwe berneda û weşana xwe di bin navê ajansa Şujin de domand. Êdî dewleta Tirk a dagirker xebata jinê kir armanca xwe ya sereke. Ji ber wê gelek rojnamevanên jin di bin navê ajansa JinNews de dest bi xebatên xwe kirin. Di heman demê de Ragihand ji ber binpêkirinên desthilatdaran û ferzkirina dorpêça li ser mekanîzmeya şopandina ragihandinê û zimanê weşanê, rastî siyaseta çewisandinê tê. Li Rojhilatê Kurdistanê jî rojnameya Kurdistanê tenê 11 mehan weşan kir. Piştî hilweşandina Komara Mehabadê rejîma Îranê rojnamegeriya Kurd li welêt qedexe kir.

**Jin û ragihandina şer**

Ragihandina şer li Bakur û Rojhiltê Sûriyê bi saya têkoşîna rojnamevanên jin ên ku şer li eniyên pêşîn de şopandin, pêş ket. Ji destpêka şoreşa Rojava ve û heta şerên li dijî çeteyên El-Nusra, Ehrar El-Şam li Serêkaniyê, Berxwedana Kobanê li dijî DAIŞ`ê, êrişên Tirkiyê yên li ser Efrîn û Şehbayê, êrişên çeteyan ji aliyekê ve û rejîma Sûriyê ji aliyekê din ve li ser taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiye li bajarê Helebê jinê karî cihê xwe bigre û gavên ber bi çav avêtin. Her wiha rojnamevanên jin cih di pêngavên tunekirina çeteyên DAIŞ`ê li Minbic, Tebqa, Reqa û herî dawî Dêrazorê de jî girtin û bûn pêşeng.

**Dengê jina Êzidî**

Çeteyên DAIŞ'ê di 2014'an de êrişî Şengalê kirin û dîmenên herî reş û tund ên li hember jinê derketin pêş. Çeteyên DAIŞ`ê bi awayekî yekser di êrişên xwe de jin û zarok kirin hedef. Li gorî serjimariya rêxistinên jin ên Bakur û Rojhilatê Sûriyê zêdetirî 5 hezar jinên Êzidî revandin. Her wiha pêkhateya Êzidî ji pêkhateyên din zêdetirî rastî paşguhkirina ragihandinê hat. Lê êdî bûne qubleya ragihandina jin a ku armanc dike azarên jinê ji revandin, êrişên cinsî û zilmê bîne ziman. Di êrişên DAIŞ`ê de yên li ser Şengal û Xane Sorê de gelek rojnamevanên jin ji tevahiya axa Kurdistanê û cîhanê berê xwe dan wir, da ku trajediya piştî vekişîna "Partiya Demokrata Kurdistanê" bişopînin. Hinekan di rêya eşkerekirina azara jina êzidî û civaka êzidî de canê xwe feda kirin. Mînak, Nûjiyan Orhan a ku ji hêla "Partiya Demokrat a Kurdistanê" ve, di êrişên li ser Xane Sorê de şehîd bû. Azarên jina Êzidî ji tevahiya jinên Êzidî re bûn têvedanek ku cîhan bi Êzidiyan, dîroka wan û azarên wan ên di 73 fermanan de nasbikin.

**Ragihandina jin dozên jinê çawa digre dest?**

Cudahî di navbera xebatên jinê di rojnamegeriya Kurd û dazgehên din de heye. Ji ber ku Rojnamegeriya Kurd jinê wek wesîleyek balkişandê li ser ekranên xwe bikar nayîne. Ji rola wê di afirandina siyastek weşanê ya taybet bi jinê dûr nexist. Ji ber ku zihniyeta zikurî ragihandina kapîtalîzmê ya cîhanî kontrol dike, rastiya jinê sîber dike û girîngî nade dozên wê. Lewra ragihanda jina Kurd ragihandike bedîl ku dikare ronahî berde ser rewşa jinê û pirsgirêkên wê çareser bike.



# Helîm Yûsiv: Romana kurdî ya nûjen pirreng û pêşketî ye

Romannivîsê kurd Helîm Yûsiv diyar kir ku ji salên 1991 heya 2020'an dikare wekî qonaxa nûjen ya romana kurdî were binavkirin û wiha got: "Romana kurdî di roja îro de mîna romanên zimanên din pirreng û pirşêwe ye. Herwiha li zimanên cîhanê yên sereke têne wergerandin û li her deverê tê naskirin."

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Roman şaxeke wêjeyî ya pexşanî ye, romana kurdî jî qada nivîskariya gelek wêjevan û romannivîsên kurd e. Rewşa romana kurdî di roja heyî de pirseke di ramana wêjevananên kurd de ye û cihê rapirsînê ye. Derbarê rewşa romana kurdî di roja îro de nivîskar û romannivîsê kurd yê ji Rojavayê Kurdistanê, Helîm Yûsiv, bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:



**-Romana kurdî di çend qonaxan re derbas bû, naverok, şêwe û zimanêromanê ji mêjûyê ber bi nûjeniyê ve çiqasî hate guhertin?**

Ez dikarim pêvajoya demdirêj ya romana kurdî ji destpêkê heta niha li ser van qonaxan parvebikim; Romannivîsên pêvajoya destpêkê 1930 – 1980: Di vê qonaxê de yekem romana kurdî hat nîvisandin û li pey wê li deverên cuda hin romanên din hatin belavkirin. Romannivîsên navbeynkar an ên "Pir" ji 1981 heya sala 1990'î de bûn, di vê qonaxê de romannivîsên di van salan de berhemên xwe belavkirin, rola pireke navbeynkariyê di navbera nifşê destpêkê û nifşên nû de lîstin. Ji hêlekê ve gelek dukmanterên destpêkê di berhemên wan de berbiçav bûn û ji hêla din ve hewildanên wan ên nûjenkirinê zemîneke baş ji nifşên nû re avakirin, da ku romaneke kurdî nûjen û li gorî pîvanên demê binîvisînin. Romannivîsên salên 1991 heya 2020'an qonaxeke din jiyan. Ev qonax dikare wekî qonaxa nûjen ya romana kurdî bê nirxandin. Di vê qonaxê de romana kurdî gavên berbiçav avêtin. Dema em dîmenê giştî yê vê romanê li Kurdistanê bi herçar perçeyên xwe ve li gel romanên li derbideriyê û li derveyî welêt hatin nîvisandin û belavkirin, li ber çavan raxînin, tê xuyakirin ku romana kurdî jî mîna romanên zimanên din pirreng û pirşêwe ye û hin romanên kurdî hêdî hêdî li zimanên cîhanê yên sereke têne wergerandin û li her deverê tê naskirin.

**-Di nivîsîna romanan de, romannivîs bêhtirî xwe, bi kîjan cureyê romanê ve meyldar dibin û çiqasî taybetmendiyên romanê diparêzin?**

Cureyên nîvisandina romanê ji kesekî heta kesekî din têne guhertin. Ji ber vê roman qadeke vekirî ya peydakirina cure û şêweyên nû ye. Romannivîs jî takekeseke civaka xwe ye. Hemû mijûlî û taybetmendî û rûdan û diyardeyên di nav wê civakê de peyda dibin, dikarin bibin mijarên romanan. Di vê serdema me de li seranserê cîhanê, roman cureyê wêjeyê yê sereke ye. Gava kesek bixwaze civakekê bi kûrahî û taybetmendiyên wê nas bike, dikare romana ku bi zimanê wê civakê tê nîvisandin bixwîne. Roman tevneke weha piralî û pircure ye ku dikare hemû mijarên jiyanê di hundirê xwe de bihewîne, bêyî ku taybetmendiya xwe weku cureyeke wêjeyî winda bike. Romana îro ji xeyal û fantaziyan bêhtir bi reyalîte û hûrgiliyên jiyana rojane ve mijûl e, ji ber ku jiyan ewqasî tevlihev bûye ku gelek caran sînorên xeyal û fantaziyan jî derbas dike.

**-Gelo romannivîsên kurd, bi romanên xwe gihaştine asta romannvîsên cîhanî?**

Gava behsa vê mijarê dibe dîtineke nivîskarê potugalî Saramago tê bîra min. Dibêje: tiştek navê wê wêjeya cîhanî tune ye. Wêje hemû herêmî ne. Tiştê vê wêjeya herêmî dike cîhanî wergêr in. Dîtineke din jî heye ku mesela cîhanîbûnê bi (navendîbûn)a Ewrupayê ve girêdide. Ev dîtin gelekî nêzîkî rastiyê ye, ji ber ku ya wekî wêjeya cîhanî tê binavkirin ew bixwe wêjeya Ewrupa û Emerîkayê ye. Bi gotineke din wêjeya welatên Rojava ye. Ew biryarê didin, wisa jî rewabûna cîhanîbûnê girêdayî nirxandina wan e. Baweriya min jî ew e, wêjeyeke resen û baş heye, wisa jî wêjeyeke xerab û astnizim heye. Ev wêjeya wekî wêjeya cîhanî tê binavkirin ew wêje ye ya ku derfeta wergerandin û belavbûnê û razîbûna dezgehên têkildar yên welatên Rojava ye. Pîvanên wan jî pirê caran dûrî asta wêjeyî û ya hunerî ya wan berheman e.

**-Tu asta romanên kurdî di van salên dawîn de çawa dinirxîne û hetanî ku pêşketineke hîn bi nirxtir di warê nivîsyariya romana kurdî de çêbibe pêwîste çi were kirin?**

Ez ne di wê rewşê de me ku karibim asta romana kurdî bi giştî binirxînim. Ev bîst û çar salên min ji derveyî welêt dijîm û di derbarê romana kurdî de ya bi hemû zaravayan û li herçar perçeyên Kurdistanê tê nîvisandin, ne ewqasî agahdar im. Romana kurdî beşek ji wêjeya kurdî ye. Hetanî ku wêjeya kurdî bi tevayî bi pêş ve neçe, wê romana kurdî jî pêşnekeve. Ev jî girêdayî rewşa zimanê kurdî û rewşa kurdan ya civakî, aborî, çandî û siyasî ye. Di halê hazir de, rewş çi dibe bela bibe, kurd dikarin li romana kurdî xwedî derkevin. Romanên bi zimanê kurdî bi berfirehî bikirin, bixwînin û bidin xwendin. Ew qonaxên xwebiçûkdîtinê li pey xwe bihêlin, ne xwe kêmî miletên din bibînin û ne jî nivîskarên xwe kêmî nivîskarên miletên din bibînin û ne jî romanên bi kurdî têne nîvisandin kêmî romanên bi zimanên din li cîhanê têne nîvisandin, bibînin.

# Navenda Mihemed Şêxo jêdera çand û hunera resen e

**Lîloz Hisên/ Qamişlo**

**Çand û huner dîrok û nasnameya gelan e û rastiya civakan vedibêje. Yek ji navendên Çand û Hunerê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê navenda Mihemed Şêxo ye ya bajrê Qamişlo ye ku ji bo çand û hunera herêmê ya resen pûye çavkanî.**

Ji destpêka şoreşa Rojavayê Kurdistanê li bajarê Qamişlo navenda çand û huner ya bi navê hunermed Mihemed Şêxo hate vekirin. Di navenda Mihemed Şêxo de gelek derfet ji ciwanan re hate peyda kirin da ku jêhatiyên xwe keşf bikin û bi demê re ev jêhatî hatin pêşxistin. Çand nasnameya gelekî ye ku ji gelekî din cuda dike. Huner jêhatiyeke pîroz e, ku mirov dikare di riya hunerê hestên xwe parve bike. Gelê kurd ji vê yekê mehrûm bûn, ji ber astengî û nijadperestiya ku li dijî wan pêk dihat




ji hêla desthilatdar û dagirkerên Kurdistanê. Yek ji berhemên şoreşa Rojava vegera li çand û hunera kurdî ya resen bû, ku bû çekek giring li dijî desthilatdar û dagirkeran rû bi rû ne. Di navenda Mihemed Şêxo de ya Çand û Huner çanda kurdî tê parvekirin û ji cîhanê re çand û nasnameya kurdî tê aşkerekirin. Wekî din pêşwaziya tevahî pêkhateyên herêmê dike bi hemû ziman û çandên heyî bêyî cudahî di navbera pêkhateyek an olekî de. Navenda Mihemed Şêxo ya Çand û Huner di sala 2012`an hate vekirin, bi armanca parastin, pêşketina çand û huner û filklora hemû pêkhatiyan.

Di navendê de 10 komên çandî û hunerî hene, herwiha komeke xweser taybetî jinan heye û koma zarokan, beşdarî hemû çalakiyên ku li herêma Bakur û Rojhilatê Sûryiyê çêdibin; dibin. Li taxa Qidûr Beg û Girbawî navend girêdayî navenda sereke ya bajarê Qamişlo heye.

**Navê komên ku cihê xwe di navendê de digrin wiha ne:**

Koma Botan ya muzîkê ji 10 endaman pêk tê, Koma Pale ya muzîkê 10 endam, Koma ş.Sakîne (xweser) 10 endam, Koma ş.Welat ya (govendê) 12 endamin, Koma ş.Osman ya şano (zarok) 18 endamin, Koma şano 8 endamin.

**Komên navenda Qidûr Beg yê girêdayî navenda sereke wiha ne:**

Koma Kulîlkên Rojava ya muzîkê 6 endam in (zarok).

Koma Saz û Awaz ya muzîkê 10 endam in.

**Komên navenda Girbawî yê girêdayî navenda sereke:**

Koma Kulîlkên Girbawî ya muzîkê 24 endam in (zarok).

Koma Nêrgizên Zagros ya govendê 8 endam in.

Navedna Mihemed Şêxo ya Çand û Huner ji bo pêşwazîkirina endaman (zarok) ji temenê 6 salî heta 16 salî ye. Yên mezin ji 17 salî û jor ve pêşwazî dike.

Di navenda Mihemed Şêxo de perwerdeyên mîna govend, mûzîk fêrbûna amûran û şano tê dayîn, herwiha hejmara mamosteyên ku tê de kar dikin 9 mamoste ne.

Gelek çalakî û festîval di navenda Mihmemed Şêxo ya Çand û Huner hatin li dar xistin, mîna Mihrîcana ş.Ronahî ya govendê, Mihrîcana ş. Yekta Herekol ya şano, Mihrîcana Orkêşa ya mûzîkê û Mihrîcana Ostirmanên bi tenê ( Solo).

Kar û xebatên navenda Mihemed Şêxo ya Çand û Huner di du mehên dawî de wiha ne: tevlîbûna koman di hemleya azadiya fîzîkî ya ji bo Rêber Abdullah Ocalan, hazirtiya ji bo Mihrîcana Netewa Demokrat û konserta zarokan ya bi drûşmeya azadî ji zaroktiyê destpê dike.

**Pilanên pêşerojê**

li gorî rêveberê navenda Mihemed Şêxo ya Çand û Huner Ehmed Hemo hazirtiyên navendê ji bo Festîvala Govendê di 27 Mijdarê, Festîvala Şano, Festîvala Muzîkê û Şahiyên dibistanên zarokan, heye.

# Jin û ciwan bingehên şerê gelê şoreşgerî ne

Ciwanên kantona Cizîrê diyar kirin ku jin û ciwan bingeha şerê gelê şoreşgerî ne, herwiha destnîşan kirin ku bi hevgirtina civakê bi hemû pêkhateyên wê hêza dijmin dişkîne.

**Jîn Hisên/ Qamişlo**

Di dema ku herêm di şert û mercên hestiyar re derbas dibe, ji bo nasîna rola ciwanan di nava şerê gelê şoreşgerî de, bi drûşmeya" Bi şerê gelê şoreşgerî em ê serkeftina cenga azadiyê misoger bikin û azadiya fîzîkî ya Rêber Apo pêk bînin", Desteya Ciwan û Werzîşê û Tevgera Ciwanên Şoreşgerî ên Sûriyê konferansek li bajarê Qamişlo li dar xistin, da ku rola ciwanan di şerê gelê şoreşgerî de bidin nasîn.

Komîteya Ciwanan ya bajarê Tirbespiyê Sefa Hesen ji rojnameya me diyar kir ku di vê demê de pir giringe rola ciwanan di şerê gelê şoreşgeî de bê nasîn, herwiha çawa em karibin azadiya fîzîkî ya Rêber Abdullah Ocalan misoger bikin.

Sefa Hesen wiha pê de çû:" Weke ciwanên herêmê divê zêdetir em xwe rêxistin bikin û asta têkoşînê û berxwedanê bilind bikin. Herî giring ku em balê bikşînin ser azadiya Rêber Apo û dengê xwe bighînin hemû cîhanê. Divê em lawaziyên heyî ku em weke ciwan tê de derbas dibin, piştî vê konferansnê xwe xurtir bikin û çalakiyên xwe berfireh bikin."

Sefa Hesen got ku ciwan pêşengên civakê ne, herwiha tekez kir ku eger îro serkeftinek pêk bê wê bi saya ciwanan ev serkeftin bê


Sefa Hesen

bidestxistin.

Sefa Hesen derbarê rola jinan di nava şerê gelê şoreşgerî de wiha anî ziman:"Jin di jiyana xwezayî de, em bêjin ji destpêka mirovahiyê pêşenga civaka xwe bû, her tişt di dema wê de bi hevsengî derbas dibû, edalet û wekhevî serdest bû ew ya fedekar bû ji bo civak û zarokên xwe, lê piştî avabûna dewleta Somer û derketina Şaman bi desthilatdariyê zilam jinê ji hemû mafê wê dûr xist, jin ji bo hawîrdorê rih û hêvî dide. Jin di rêveberî û rêxistinê de roleke wê ya mezin heye. Jina ciwan roleke mezin lîst di şerê li dijî DAIŞ`ê de di eniyên şer de berxewdan û têkoşîn kir, bi taybet jina ciwan a kurd ku bû sembol û nimûne ji bo tevahî jinên cîhanê, ji ber vê yekê rêber Apo giringiyê dide jinê nemaze di nava şerê gelê şoreşgerî de. Jin û ciwan bingehên di nava şerê gelê şoreşgerî de.

Herwiha endamê kordînasyona ciwanên şoreşger li Bakur û Rojhilatê Sûriyê Hogir Elî wiha diyar kir:" Sîstema îşkence û qirkinê ku li ser Rêber Apo tê meşandin, armanca wê qirkirina tevahî gelê kurd e, li ser vî esasî me dît weke ciwan li gorî qonaxa ku em tê de derbas dibin konferanseke wiha li dar bixin, ji bo ku em karibin xwe rêxistin bikin û li hemberî êrîşên li ser herêmê bisekinin. Herwiha ji giringtrîn armancên me azadiya fîzîkî ya rêber Apo misoger bikin. Divê tevahî ciwanên pêkhateyên cuda ku di herêmê de bi hev re jiyan dikin, li ser bingehê şerê gelê şoreşgerî xwe amade bikin li dijî her êrîşeke li ser herêmê pêk bê."


Hogir Elî

Hogir Elî bal kişand ser ciwanên kurd û wiha got: Divê hemû ciwanên kurd di nava her çar parçeyên kurdistanê xwe amade bikin, ji ber ku em di demeke hesas re derbas dibin, dijmin hewil dide guhertina demografîk û asîmîlasyon pêk bîne, lê bi têkoşîn û berxwedana hêzên me, ev pilan tên têkbirin".

Hogir Elî wiha domand: "Rola ciwanan di şerê gelê şoreşgerî de pir giring e, ji destpêka şoreşa Sûriyê ciwanan roleke mezin lîstin di damezirandina hêzên leşkerî û xurtkirina wê, herwiha di avakirina saziyan û rizgarkirina herêman de. Ji bo guhertina her cihekî ber bi pêşketinê ve ciwan hêzeke dînamîkin."

Hogir Elî di axaftinên xwe de bal kişand ser girêdana ciwanan bi çandê ve û wiha anî ziman: "Dijmin her hewil dide çanda civakan bihelîne, herwiha nijadperestiyê derxîne di nava çandên di herêma me de hene, lê niha li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê rengê cuda ji çandan, olan û pêkhate bi hev re jiyan dikin, bi saya felsefeya jiyana hevbeş û netewa demokratîk ku rêber Apo ji me re pêşkêş kir. Ciwanên herêmê bi hev re bi tevahî çandên heyî ji suryan, ermen,aşûr, çerkez kurd û ereb û hwd.. kar û xebat dikin. Cihekî ku çand lê hebe exlaq heye. Dijmin niha bi hemû awayan şerê herêma me dike, çi di riya belavkirina madeyên hişbir an jî fihûşan da ku van çandan qir bike, bi fikir û felsefeya rêber Apo em ê van êrîşên ku li ser ciwanan pêk tê têk bibin".

Di dawî de Hogir Elî wiha got:"Netewa Demokratîk û hevgirtina civakê easa têkçûyîna planên li dijî herêmê pêk tê. Bi Hevgirtina di navbera tevahî çand û olan de wê hêza dijmin bê şikenandin".

## Komar bû koremar



Hafiz Ahmet Turhalli

Sed sal ser komara Tirkre derbas bû, lê vê komarê dîrokekî nebaş û tije xirabî lipey xwe hişt. Divê em carekî din li dîroka xwe vegerin, ka vanan ev komar bi kîjan awahî damezrandin û hişmendiya wan çibû?

Dema komar tê avakirin, du kongreyên sereke tên pêkanîn. Ji vanan yek ji bo Kurdên misilman bixapînin li Erzurimê tê pêkanîn û ya duyem jî ji bo Kurdên Elewî werin xapandin li Sêwazê tê pêkanîn.

Dema komarê ava dikin soz û peymanan didin Kurdan û dibêjin ev komar ewê bibe komara me herdû milletan. Piştî komar hate avakirin, bi xapandin û kemînan, bi navê biratiyê û xwe modern kirinê Kurd hatin qetil kirin. Qada ku Kurd têde Rewşenbîr û Rêberên wan dihatin perwerde kirin, kû dibistan û Ocaxin, hatin qedexe kirin. Bi zagonên ku ji bo mêjî, zanebûn, çand û dîroka me Kurdan ji holê rakin, Ji meclîsa kû qaşo meclîsa Kurdan û Tirkan bû, biryar hatin girtin. Di vê Meclîsêde kesên xwefiroş kû alîkarî û hevkariya çespandina vê komara qirker dikirin jî hebûn. Meclîsa ku giraniya wan alîgirê recîma Kemalîst bûn, bi van zagonan civaka Kurd terorîze kirin. Rêberên Kurdan yên Misilman û Elewî jî, weke kesayetên paşverû neyarê komarê, mirovahiyê û dij qanûnan pênase kirin. Di rastiyêde zana û Rewşenbîrên Kurdan, dibistan û Ocaxên Kurdan weke dijminên dewletê yên sereke hatin destnîşan kirin.

Ev Komar bi alîkarî û destgirtina Kurdan hate ava kirin, lê mixabin Kurd weke neyarên sereke hatin destnîşan kirin û bi qirkirinan re hatin derbas kirin. Hişmendiya vê komara hov bû tunekirina Milletan û Bawermendan. Li vê komarê tenê Tirkçitî û ola ku bi nav Îslam, lê di rastiya xwede nîjadperestî bû hate xurt kirin. Di komara Tirkde, weke devê mengenekî kuştin û helandina milletan, ol û mezheban hate pêşxistin.

Divê em ji bîr nekin, sed û yek saliya komara qirker, heman demê de sêdarê kirina Şeyx Seîdê kal û hevalên wî ye. Divê em Kurd jî sedsaliya serhildana Şêyx Seîd, bikin azadiya serokê gelê Kurd Abdullah Ocalan û statuya Kurdîstan.

Henekî ji Kiryarên vê komarê:

Şeyx Seîd, Seyîd Riza û bi sedhezaran Kurdên bi şeref hatin qetil kirin. Bi dehan bajar, bi sedan navçe û bi hezaran gundên Kurdan hatin xirakirin. Ser erd û bin erdê Kurdan hatin talan kirin. Ziman, çand û dîroka Kurdan hate qedexe kirin. Hêjî cîhên Mezelê rêber û şehîdên me nayin zanîn. Li Kurdistanê bê navber şer hate ragihandin û ev şerê qirêj bi hemû cureyên kirêt hêjî didome. Ev bîst salê dawîyê jî bi navê Ola Îslamê Kurd bi destên vê dewleta hov têne qetil kirin. Erdogan û Bexçelî ne tenê li Bakurê Kurdistanê li Başur û Rojavayê Kurdistanê jî li ser wean qirkirin tê meşandin.

Wê komarê ji bo me Kurdan re ji derveyî tunne kirin, hêjarî, nezanî û qirkirinê tiştekî din neanî.

Nehajî weke kore marekî Erdogan û Bexçelî dixwazin Kurdan bixapînin. Kore Mar, bi Navê Ol û biratiyê, carekî din li xapandina berê sedsalî digere. Bi vê şoreşa hemdem Kurdan kore Mar baş nas kir, di zane kore mar çiqas xayîn û bê bexte. Kurd ne Kurdê sed sal berêye!

# Rêxistina Nûdem: Divê xwedî li kesê astengdar bê derketin

**Zana Roj/ Şehba**

**Ji bo alîkariya zarok û kesên astengdar li kantona Efrîn û Şehbayê Rêxistina Nûdem Ya Amedekirin û Geşedanên Mirovî Yên Astengdaran li herêmê hate orgenîzekirin. berdevka Rêxistinê da zanîn ku astengdara perçeyek ji jiyanê ne û divê xwedî li wan bê derketin.**

Rêxistina Nûdem ya Amedekirin û Geşedanên Mirovî Ya Astengdaran ji demeke ne dirêj de xwe li herêmê birêxistin kiriye. Ev Rêxistin di asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê de hatiye avakirin û şaxên xwe li hermû herêmên Rêveberiya Xweser belav dike. Ji ber rewşa Herêma Şehbayê ya ku piraniya koçberên Efrînê lê bi cih bûne, di nava zehmetî û azarên ku ji aliyê êrîşên dagirkeirya Tirk û dorpêça Hikumeta Şamê gelek rewşên nexweşî û mirovî derdikevin pêş ku bê destwerdan dimînin. Li ser vê bingehê ev Rêxistin Nûdem xwe li Kantona Efrîn û Şehbeyê ji nû ve orgenîze kir û dest bi xebatê xwe dike. Têkildarî mijarê berdevka Rêxistina Nûdem ya astengdaran Leyle Reşîd ji rojnameya me re axivî.


**Gavên destpêkê yên Rêxistina Nûdem**

Leyle Reşîd di destpêka axaftina xwe de balkişand ser armanca avabûna Rêxistina Nûdem û wiha got: "Zêdetirî salekê ye Rêxistina Nûdem di giştî Bakur û Rojhilatê Sûriyê de hatiye avakirin. Ew tenê ji bo kesên astengdar xebatê dike û ji wan re dibe alîkar. Armanca me ku em bikaribin ji jin, zarok û çi kesên astengdar e bibin alîkar û wan di nava xwe de bihewînin. Li herêma Şehbayê jî pêwîstî heye ku ev Rêxistin li vir jî bihate avakirin, ji ber rewşa Şehbayê weke cografî her wiha zehmetiyên ku gel tê re derbas dibin bê guman ne hêsane. Bi taybet ev rewş li ser van kesên astengdar hîz zêdetir xisrab e û dibe sedem ku rewşa wan aloztir bibe. Ji lewra Ev xebat nêzî 2 heyava ye li Kantona Efrîn û Şehbayê hatiye birêxistin kirin. Di rewşa heyî de em du heval bi vê xebatê re mojûl dibin. Di gavên destpêkê de me serjimariya kesên astengdar di herêmê de girt û piştire me dest bi xebatê xwe kir. Niha hejmara astengdarên ku em bi wan re mijûl dibin 70 kese ji zarok, ciwan û kesên temen mezin. Weke gavên destpêkê me hemû malbat ziyaret mirin, her wiha em heftane wan kom dikin perwerde û çalakiyan pêş dixin. Heyanî niha ev gav hatiye qebûl kirin û bi erênî ji aliyê malbatên astengdaran ve tê nirxandin."

**`Perçeyek ji jiyanê ne`**

Leyle wiha axaftina xwe domand: "Xebata me xebatekî menewî û tenduristî ye, em hewil didin ku bi kesên nexweşiyên wan yên zikmakî hene bibin alîkar û tiştên li gel wan pêşbixînin. Hin astengdar hene xwedî deryayên pir cuda ne, hin hene wênexêzên taybet girêdayî Efrîn û çanda xwe çêdikin. Bê guman ji bo astengdarekî ev yek pir bi wate ye û divê aliyek hebe ku jiyanê li hemebr wan xweşik bike. Ev astengdar perçeyek ji jiyanê ne û divê xwedî li wan bê derketin. helbet ev yek tenê li ser milê Rêxistina Astengdaran namîne. Malbat aliyê herî bingehîn yên ku bibe desteke, li ser vê bingehê têkiliy me bi dayîk, bav û malbatan re jî heye. Her wiha gelek astengdar hene derbasî dibistanan jî bûne û ji ber rewşa wan nikarîn dibistanê berdewam bikin. Em di nava tensîq û xebatekê de bûn da ku astengdarên dikarin bixwînin; xwendina xwe berdewam bikin."

**Alîkariya rewşên ku têne tedawîkirin**

Leyla di dawiyê de diyar kir ku ji bo rewşa hin astengdaran bi aliyên tenduristî re kar dikin û wiha pê de çû: "Dema me serjimariya van kesan girt, hin rewş hene pêdiviya wan bi tedewîkirina tenduristî heye. Di encam de me bi aliyên tenduristiyê re têkilî avakirin û bi kêfxweşî ev yek hate pêşwazîkirin, ku em bi rewşên çavdêriyê û tedewîkirina wan re di nexweşxaneyan de bibin alîkar. Em di wê baweriyê de ne ku li ser bingeha Exlaqî û erkên xwe yên mirovî em di rewşekî wiha de him ji malbat him jî ji bo pêşxistina jiyana van kesan bibin hêz, destek û cihê baweriyê".



# Kûjerên gelê kurd li Hewlêrê têne pêşwazîkirin

Bi hemdemiya êrîşên dagirkeirya Tirk li ser tavahî gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, hedefgirtina Gerîlayên Azadiyê li Herêmên Parastinê yên Medyayê û kiryarên çeteyan li herêmên dagirkirî; PDK ê rêya xiyanetê doza gelê kurd bi hembêzkirina çeteyên ku kurdan qir dikin, nû dike.

**Zana Roj/ Şehba**

Di berdewamiya xeta îxanta mala Berzanî de careke din ev yek di pêşwazîkirina hin serkêşên komên çeteyan di Hewlêrê de xwe nû dike. Encumena bi navê "Encûmena Niştîmanî ya Kurdî" li Hewlerê pêşwazî li "Serokê Desteya Danûstandinan" Bedir Cemûs û nûnerê çekdarên "Sultan Murad" Ehmed Osman kir, Ev hevdîtin di çarçoveya "Civînên danpstandinan" de pêk hat.

Ev pêşwazî di demekê de ye ku êrîşên dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê yên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê berdewam dikin, binesaziya herêmê dike armanc ya ku di encamê de zêdetirî 30 navendên jiyanî ji kar hatin derxistin, 17 kes jiyana xwe ji dest dan û 65 kes jî birîndar bûn. Bê gu,an ev ne cara yekemîn e ku Hikumeta Başûrê Kurdistanê van pilanan dike, bi sedan caran dest daye reyadarên Faşîzma Tirkiyê û komên Çeteyan yên ku niha di herêmên dagirkirî de û bi taybet di Efrînê de li ser xwîna gelê Kurd jiyan dikin.

Têkildarî vê mijarê Endamên Meclîsa Kantona Efrîn û Şehbayê Leyla Hisên û Necî Selemê ji rojnameya me re axivîn.





**Bi kûjerên gelê Kurd re dibin yek**

Leyla di destpêkê de da zanîn ku komên çeteyên ku bûne sedema hemû kiryar û binpêkirinên pîvanên mirovî di Efrînê de îro dibin dostê Berzanî û wiha domand: "Dîroka komên çeteyan bi xwînê hatiye nivîsandin, di seranserî aloziya sûriyê de bûn bingeh ji talankirin, kûştin û wêrankirinê re. Ev komên çeteyan xwe li ser tunekirina gelan bi navê ol û parastina Mislimantiyê hatin avakirin. Di bin van navan de bûn sedema kuştina bi milyonan ji Jin, zarok û gelan, ev komên çeteyan bi destê dagirkeriya Tirkiyê û dewletên li ser hişmendiya olî ya kevneperest ku dixwazin bi navê ol Rojhilata Navîn dagir bikin hatin avakirin. ev komên çete di hişmendiya wan de hemû xwe disipêrin zihniyeta xetertirîn teror DAÎŞ ê. Li ser vê bingehê ji bilî tundî û kuştinê tu armanceke wan ya din tuneye. Îdiyaya aşîtiyê dikin lê di piratîka wan de tu têkiliya wan bi aşîtiyê re nîn e.

Divê em ji bîr nekin ku ev çeteyên xwînvexwar di Efrîn, Serê Kaniyê û Girî Sipî de çi bi serê gelê Kurd kirin. Bi taybet di Efrînê de bi hezaran gel dan ber Kuştinê bi hezaran destdirêjî li jinên Kurd kirin, bi sedan zarokên Kurd hatin Kuştin û bi temenên biçûk hatin zewicandin. Demografiya Efrînê bi tememî dane guhartin û hemû ser erd û bin erda wê talan kirin. ev ji bilî tundiya rojane ya ku gelê me tê re derbas dibe de. Îro hikumeta Başûrê Kurdistanê Mala Berzanî careke din destê xwe dide van çeteyan û dîroka îxaneta xwe careke din berdewam dike; ev binpêkirina pîvanên welatparêzî û xwînê ye".

**PDK ê dijberiya xwe li hember Rêveberiya Xweser tekez dike**

Her wiha Leyla xuya kir ku PDK ê bi êrîşên heyî yên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê re eniya xwe diyar dike û wiha got: "Dagirkeirya Tirkiyê li seranserî herêmê Bakur û Rojhilatê Sûriyê êrîşeke hovane ku gelek sivîl tê de bûne qurbanî da ye destpêkirin, di van êrîşan de jêdarên jiyanî yên herêmê hatin hedefgirtin. Ev êrîş bi mabesta hedefgirtina Rêveberiya Xweser û felsefeya Neteweya Demokratîk di herêmê de têne kirin. PDK ê bi hemwextiya gurbûna van êrîşan re li Bajarê Hewlêrê pêşwaziya Serçeteyan dike, armanc vê yekê ji bilî tekezkirina îxaneta xwe û dijberiya Rêveberiya Xweser nîn e. di vê demê de PDK eniya ku tê de şer dike û lihevhatinan dike diyar kir".

**PDK ê sed saliya Komara Tirkiyê pîroz kir**

Necî bal kişand ser bi hemwextiya salvegera demazrandina komara Tirkiyê ya 100 salî re ejîndatên wê yên weke PDK ê ev yek pîroz kirin û wiha got: "Dîroka Komara Tirkiyê li ser xwîna gelan hatiye avakirin, bi derbasbûna sed salî li ser avabûna Komara Tirkiyê re ejîndatên wê yên weke PDK ê ev yek bi şandina pîrozbahiyan hate pêşawzî kirin. her wiha PDK ê ev yek bi pêşwazîkirina van çeteyan di Hewêrê de pîroz kir. ev hevdîtin bê guman bi pilanên berfireh hatine çêkirin. Lê Hikumeta Başûrê Kurdistanê vê yekê li ber çavên gelê Kurd di Başûrê Kurdistanê de dike. ev yek nameyeke ji PDK ê ku dibêje em bi we re ne û hin çi dikin bikin emê piştgiriya we di qirkirina gelê Kurd de bikin".

**Divê gelê Başûrê Kurdistanê di rastiya PDK ê de serwext bin**

Necî di dawiya axaftina xwe de ev anî ziman: "PDK ê bi van gavan tu cihê wî di yekrêziya gelê Kurd de nîne. Gelê me ya Başûrê Kurdistanê divê di vê rastiyê de serwext be, PDK ê di van kêliyan de rawekirina dagirkeriyê di herêmên dagirkirî yên Kurdistanê re erê dike. ji lewra em banga gelê xwe yên Başûrê Kurdistanê dikin ku li hember ev îxaneta ku neheqiyê li dîroka gelê Kurd dike bisekinin û rê ji PDK ê re di perçekirina Kurdistanê re venekin".

# Êriş û sûcên dagirkeriya Tirk li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyê

**Birûc Resûl/Qamişlo**

**Di êrişên dewleta Tirk a dagirker li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê, yekser qadên jiyanê û cihên peydakirina pêwîstiyên rojane yên civakê hatin armancgirtin. Ji ber van êrişan ziyaneke madî pir mezin gihiştiye binesazîya herêmê.**



Di hemû cîhanê de tê nasîn ku av, elektirîk, nan û nift cihê ku mirov jiyana xwe li ser dimeşîne, lê dewleta Tirk a dagirker mafê jiyankirina gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê naxwaze bibîne û bi taybet ku sîstema Netewa Demokratîk li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatiya rûnişkandin, vê yekê ji bo xwe giran û xeter dibîne. Di topbarana dawî ya ku di 23`ê Cotimehê de dewleta Tirk a dagirker li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê de destpêkir, êrişî navendên xizmetguzariyê û kargehan kir, wiha kir da ku av ji bajaran û gundewarê wê qut bike û stûyê mirovahiyê di destên wê de teng bike, di heman demê de di nav bêdengiya navdewletî ya tarî de ev êriş û sûc dewam dike.

**Ard û parçeyên rokêtên dagirkeriyê tevlîhev bûn**

Dagirkeriya Tirk depoye genim ên Eyn Îsa, Qamişlo û Kobanê bombebaran kir û zirar gihand ard ku gel pê jiyan dike. Dema ku Rojnemeya me zirarên depoyên genim ên bajarê Qamişlo li taxa El-Entariyê şopandin, hat dîtin ku bi sedan tonên ard zerar dîtin, li wir ard û parçetên rokêtên dagirkeriya Tirk tevlîhev bûbûn. Wek tê zanîn ku yekemîn çavkaniya jiyana mirov nan e, nêzî 500 ton ard li firinan li bajarê Qamişlo û gundewarê wê dihat belavkirin, ev êrişên ku kargeh, navendên xizmetguzariyê û depoyên genim hedef girtin, Tirkiyê xwest ku hêdî hêdî jiyanê li herêmê bide sekinadin.

**Bêdengiya hêzên Navnetewî**

Ji bilî ziyanên madî û manewî yên ku li herêmê çêbûne, gelek welatî dema ku karê xwe yê rojane dikirin şehîd û birîndar bûn, ev jî rengekî komkujî e ku li ser gelê herêma Bakur û Rojhilatê Suriyê pêk tê. Tenê mafê mirovahiyê û edalet li kur man. Her kes van sûcên dewleta Tirk a dagirker dibîne, gelo çiman xwe ker û lal dikin, diyare ku dewletên Navnetewî çiraya kesk didin dewleta Tirk a dagirker heya ku bi rehetî sûc û komkujian pêk tîne û hisaban nake.

Dema ku mijar dibe gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê hêzên navneteweyî xwe bêdeng dikin. Hêzên ku îro ji bo Fîlîstîn û Lubnanê nerazîbûnê nîşan didin, li hemberî êrîşên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê nerazîbûneke biçûk jî nîşan nadin. Ev bêdengî bandorê li berxwedana gelan nake; gel xwe bi tenê nabîne. Berevajî vê yekê berxwedana xwe ya ku xwe dispêre hêza xwe xurt dike. Birînên xwe bi xwe dipêçe.

**Dirûşmeya berxwedanê**

Êriş li ser qadên jiyanê yên civakê û cihên ji pêwîstiyên jiyanê hatin kirin. Xisara madî rû da, lê belê nekarîn îradeya gel bişikînin, nekarîn koçber bikin. Lewma êriş careke din hate têkbirin. Ji roja destpêkirina êrişan û pê ve gel daket qadan û dirûşmên berxwedanê bilind kir.

**Ev êriş xeteriyeke mezin li ser rewşa mirovahî, xizmetguzerî û civakî çêdike**

Di nava 4 rojan de dewleta Tirk a dagirker di aliyê asîmanî de êrişî herêm, binesazî û herêmên ku sivîl di wan de dijîn li Cizîrê û Kobanê , Til Temir û Eyn Îsayê dike. Her wiha çeteyên wê êrişên bejahî pêk tînin, sivîl û şêniyêne yên Efrînê ku neçarî koçberiyê bûne li herêmên Şehba û Şêxmeqsûd dikin hedef.

Ev êrişên ku bêyî tu hincetên rewa têne kirin dixwazin rewşên aborî bi rêya hedefgirtina sazî, navendên xizmetguzerî û jiyanî, zehmet bikin û ew jî ji bo pilanên xwe li dijî gelê Kurd pêk bîne. Her wiah ev êriş xeteriyeke mezin li ser rewşa mirovahî, xizmetguzerî û civakî çêdike û dihêle ku şaneyên terorîst û çete sûdê ji van êrişan bigre da ku xwe birêxistin bikin û êrişî herêmê bikin, hewldanên aramiyê sînordar dike û gefan li xebatên tunekirina terorê ku gel û hêzên herêma Bakur û Rojhilatê Suriyê yên ewlekariyê bi hevkariya Koalisyona Navneteweyî, asteng dike.

**Encamnameyên Êrîşên Dewleta Tirk Wiha ye;**

Hejmara êrişên bi balafirên keşfê 118 êrîş in

-Hejmara êrişên balafirên şer 20`in

-Hejmara êrişên bi Topên hawanan 893`in

-Hejmara tevahî a êrişên dewleta Tirk a dagirker 1031`in

-Hejmara şehîdan: 17

-Hejmara birîndaran 65`in

Her wiha stasyonên kehrebeyê yên bajar û herêmên Qamişlo, Kobanî, Amûdê û Dirbêsiyê hatin hedefgirtin û ji ber bombrbarana artêşa Tirk a dagirker zêdetirî 150 hezar malbat ji kehrebeyê qut bûn , Her wiha ji ber qutbûna kehrebeyê li stasyonên avê, ava wan qut bûye.

Her wiha bû sedem ku mazot negihêje navendên xizmetguzariyê, bi taybetî firne û navendên din ên xizmetguzariyê, bû sedema kêmbûna ji madeya sotemeniyê.

# 1`ê Mijdarê;Roja serkeftina mirovahiyê

**Cenga dîrokî ya Kobanê bû serkeftina mirovayê û sembola berxwedana azadîxwazên enternasyonalîst ya li dijî tarî û zordariyê. Çeteyên DAIŞ'ê ku artêşê welatan li hemberî wê direviyan, li warê berxwedana sedsalê ya Kobanê bibin ketin û dengê berxwedanê û azadiyê hat bilinkirin.**

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Bêguman şoreşa Rojava di sedsala 21'emîn de ji bo gelên bindest û şoreşger bû hêviya azadiyê. Ev şoreşa ku di bingeha wê de Paradîgmaya Konfederalîzma Demokratîk heye, ji niha ve bûye hêviya civakên bindest. Şoreşa Rojava ya ku li ser vê pergalê hatiye hûnandin, ezmûna xwe ya herî mezin di şerê dijî DAIŞ'ê de da. Bi êrişên DAIŞ'ê yên di 15'ê Îlona 2014'an de dest pê kir, derket holê ku civaka bi vê pergalê ve hatiye rêxistinkirin çiqas dikare di xwe de asta têkoşîn û berxwedanê ava bike. Berxwedana şervanên YPG û YPJ'ê ya 134 rojan, ji bo gelên cîhanê jî bû çavkaniya têkoşîn û berxwedanê. Lewma li gelek deverên cîhanê kesên ku qet heya niha dengê kurd û Kurdistanê nebihîstine ji bo di vê têkoşîna mafdar û xwedî îrade de cih bigirin herikîn Rojava.

### Li dijî zordariyê

Ji bo piştivaniya berxwedana li dijî DAIŞ û çeteyên ji hêla dewletên dagirker ve tên rêxistinkirin gelên cîhanê piştgiriya xwe ji bo gelê kurd ragihand. Ev herêma ku qet ne di xema kesî de bû, di demeke kurt de bû cihê şervan û şoreşgerên enternasyonalîst. Ev kesên bi hemû hebûna xwe ve baweriya wan bi wekhevî û îradeya gelan heye, li vê derê dikarîn xwe îfade bikin û li dijî zilm û zordestiyê têbikoşin.
Yekem car e gelê kurd bi têkoşîn û berxwedana xwe, li qada nevneteweyî wiha deng veda. Ev berxwedan sînor derbas kirin û bû cîhanî. Ji bo ev berxwedan û têkoşîn neyê jibîrkirin û pira gelan a li dijî zilm, dagirkerî, qirkirin û înkarê, bi îlankirina 1'ê Mijdarê Roja Kobanê ya Cîhanî şoreş hat tacîdarkirin.

### Berxwedana Rojava li cîhanê deng veda

Ev berxwedana destanî ya li Kobanê û tevahiya Rojava li dijî çeteyên DAIŞ'ê bi navê mirovahiyê hate meşandin, ne tenê li Rojava û Rojhilata Navîn, li nav tevahiya mirovahiyê sempatî û piştgiriyeke mezin da afirand. Şoreşa Rojava ne tenê ji aliyê kurd, ereb, asûran ve pêk hat, ji Ewropayê heta Amerîkayê, ji Kanadayê heta Rojhilatê Dûr bi berxwedana mirovên enternasyonalîst gihaşt asta herî bilind.
Hêzên dagirker li Rojava negihîştin armanca xwe ya kirêt. Niha bi plan û tevgerên cuda li pey têkbirina vê şorêşê ne. Dagirkirina Efrîn, Serêkanî û Girê Spî parçeyên vê plana qirêj in.

### Di rêya tarî de

Ji bo şoreşa Rojava dorpêç bikin û wê bifetisînin, serî li hemû rê û rêbazan didin. Ev xebatên ku di pêşengiya dewleta tirk a dagirker de tên meşandin ji xwe re hevalbend mîna PDK'ê jî daye çêkirin. Di vê rêya reş û tarî de, kurdên rêya xwe winda kirine dixwazin civaka kurd jî bi xwe re bikişînin nav vê tarîtiyê.

### Xwedîderketina nirxên mirovahiyê

Ji destpêkê ve dewleta Tirk a dagirker hem dixwaze şoreşê bifetisîne, hem jî çeteyên DAIŞ'ê ji nû ve derxe holê û bi rêya van çeteyan xewn û xeyalên xwe yên hikumkirina li herêmê bi cih bîne. Bêguman ev êrişên ku li ser herêmê tenê ji bo gelê kurd, ji bo aramî û ewlehiya herêmê jî metirsiyek mezin e. Lewma parastin û xwedîderketina li Rojava ku bi nirxê hevpar ê mirovahiyê hatiye bidestxistin, xwedîderketina li nirxên mirovahiyê ye.



### Roja 1`ê Mijdarê dengê azadiyê hat bilind kirin

Gelên cîhanê yên li dijî êrişên DAIŞ`ê û dewletên dagirker xwedî li Rojava derketin, bi wesîleya 1'ê Mijdarê Roja Kobanê ya Cîhanî jî dengê xwe yê azadî û serkeftinê li cîhanê bilind dikin. Di vir de ya girîng ew e ku gelê kurd bi sazî, rêxistin û partiyên xwe ve xwedî li vî nirxê hevpar derkeve û ji bo azadiya gelê kurd a her dem têbikoşe lê heyf û mixabin ku hin aliyên ku bi nasnameya kurdî tevdigerin, li şûna xwedîderketin û parastina van nirxan, di nav hewildanên têkbirina wan de ne. Ev neyartiya li gelê kurd hêdî hêdî gihîştiye asta dijminatiyê!
Hêvî û daxwaza gelê kurd her tim ew e ku di nav partî û rêxistinên kurdî de yekitî ava bibe lê partiyên xwedî van kiryarên xirab çiqas dikarin di xwe de îradeya yekitiyê ava bikin cihê gumanê ye.

### Berxwedana Kobanê destpêka têkçûna DAIŞ'ê li Sûriyê bû

Piştî 6 salan ji rizgarkirina bajarê Kobanê, pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê di bin banê Hêzên Sûriyê Demokratîk (QSD) de û bi desteka Koalîsyona Navneteweyî ya li dijî DAIŞ'ê hebûna DAIŞ'ê di aliyê erdnîgarî de li Bakur û Rojhilatê Sûriyê têk bir.
QSD'ê piştî têkbirina DAIŞ'ê li bajarê Baxozê yê gundewarên Dêrazorê baregeha dawîn di destê DAIŞ'ê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê de di Adara 2019'an de tunekirina DAIŞ'ê ragihand.
girîng ew e ku di salvegera 1'ê Mijdarê Roja Kobanê ya Cîhanî de asta daxwaza azadî û têkoşînê di gelê kurd de mîna roja destpêkê germ û bi coş e. Ev jî bersiva herî xurt e ji bo hêzên neyartiya gelê kurd dikin.

---



## Pêvajoyên Çareseriyê!

**Ahmet Aktaş**

Ev bû cara dudan e ku pêvajoyên çereseriyê dikevin rojevê. Ji bo ev pêvajoya ku niha ketiye rojavê baştır were zanîn, divê pêvajoya despêkê zelaltır were nasîn.
Pêvajoya yekê, pêşî di sala 2009'an de li Osloyê di navbera MIT û PKKê de despê kir.
Di sala 2012'an de, piştî Rêceb Erdogan di televizyonê de ev pêvajo ragihandin û li pev vêna, êdê di sala 2013an de danstandinên navbera rayedarên AKPê û BDPê dewam kir.
Heta di Newroza 1015an de peyama Rêber APO hat xwendin, danstandinên navbera rayedarên AKPêe û BDP-Imrali-PKKê bênavber dewam kirin.
Piştî xwendina peyamê, gav bi gav sarbûn kete navbera şandeyên Tevgêra Azadiyê(Kurdan) û AKPê.
Ji ber ku êdî rûyên rayedarên AKPê yên qirêj û reş, qonax bi qonax xwe nîşan didan.
Jixwe piştî ku pêvajo hat rawestandin armanca wan a malxerab û planên wan ên dujminkarane yek bi yek derketin hole.
Hat xuyakirin ku hîn di nîvê pêvajoyê de(30 Cothem 2014an-Civîna Konseya Ewlekariya Milî), bi plana hılweşandınê biryarên qirkirina Tevgêra Azadiyê standine û gav bi gav dane meşandin.
Di biryarên vê planê de, modela Sri Lanka weke mînak hatibû standin û xwestin bi vê modelê Tevgêra Azadiya Kurdistanê bi tevayî hilweşînin.
Bi gotinek din, Dewleta Srilanka bi çi şêwazên sixtekariyê û xapandinê Tevgêra Gelê Tamilan hilweşandin, xwestin heman malxerabiyê bînin serê Tevgêra Gelê Kurdistanê jî. Komkujiya Parisê û hwd.
Lê Tevgêra Azadiyê, bi van leystokên wan hesiya, amadekariyên xwe xurtir kir. Berovajî plana wan, hîn xurtir ji vê pêvajoyê sûd wergirt; li Rojava Şoreş pêkanî, di hilbijartinên 7ê Hezîrana 2015an de AKPê ji desthilatiyê û rêveberiyê xist xwarê û hwd!
Bêgûman him Receb Erdogan û him bi taybetî xwediyên vê projeya Eqlê Jor, hêrs bûn û Pêvajo dan rawestandin.
Îca xwediyê vê projeya Pêvajoya Nû jî, her heman Eqil e. Lê vê carê şerd û mercên cîhanê bi giştî hatine guhertin û hewcedariyên vî Eqlê Hegemonên cîhanê zêdetir bûne.
Di vê qonaxa nuh a şerê cîhanî de, bi taybetî hewcedariya wan bi hêza gelê Kurdistanê zêdetir bû ye.
Erê, her çendîn bi bingehîn armanca hegemonan; Tevgêra Gelê Kurdistanê bixin bin bandora xwe û ji bo xizmetên xwe bidin xebitandin, belê vê carê dibe ku hinek ders jî girtibin ji berxwedan û biryardariya Rêber û Tevgêra Azadiyê, lewma heke nikaribin bixin bin bandora xwe, ji naçarî wê razî bibin ku bi wan re jî bixebatin.
Hilbet di vê pêvajoya derbasbûyî de, bêbaweriyek mezin ketiye navbera her du aliyan, bi giranî jî baweriya Tevgêra Gelê Kurdistanê, pirtir şikestiye ji Receb Erdogan. Jiber vê mijara giring Devlet Bahçelî xist ser rêya Pêvajoya Nuh a lihevhatinê.
Di vê Pêvajoyê de, destê Tevgêra Azadiyê xurtir e. Jiber ku ti çek û şêwazên qirêj neman ku Receb Erdogan li dijî Rêberî û Tevgêra Gelê Kurdistanê neda meşandin.
Lê dîsa jî ne şikest û ne hilweşiya. Belê him li qada neteweyî û him li qada navneteweyî, berovajî, nasyarî û piştgrya xwe zêdetir kir.
Şensa pêşkeftina vê Pêvajoyê pirtir e, bêgûman divê kes, hişyariyê û tedbîrê ji destên xwe bernedin!

---

# Li vî welatî 'Gurên Boz' dibin 'Nemrût' Ev der Kurdistan e!

**Volqan Elî**

Ergenekon!..Xwendekarên dîroka gelê Tirk hinekê bihîstibin, bizanin wê were bîra wan ku ev destaneke êl û hozên Tirk e. Ji ber ku rasterast mijara me ne ev e, em ê kurt lê bidin. Werhasil, li gorî destanê hozeke pêşiyên Tirkan dema di koçberiyê de ye li çiyayekî asê dimîne. Çiyayên sext û asê rê nadin ku ew bi rêya xwe biçin. Gurekî Boz dikeve pêşiya wan û wan digihîne saxlemiyê. Ji vê bi şunde êlên Tirk, gurên boz ji xwe re pîroz dihesibînin.
Na, kêmasî û şaşitiyek yan jî tiştekî ku mirov li vê derê biçûk bibîne, tine! Kêmasî, biçûkbûn û dermirovî di nêzîkbûna netewe-dewletên faşîst de ye. Ew çi dikin? Eger gotin di cihê wê de be, ji ta heta bi derziyê her tiştî dikin mijara neteweperestiyê. Wekî vê destanê, asayî ye ku civakên mirovan tiştekî feydaya xwe gihaştiya civaka wan pîroz bibîne. Ew ne kêmasî yan jî şaşîtiyeke wî gelî ye. Faşîzma modernîteya kaptalîzim wisa lê dike. Çanda gelekî, dîroka hozekê dike mijara nijadperestiya xwe.
Werhasil, îro jî Dewletê şirîkê Erdogan ku di baxçeyê faşîzmê de aqil û hişê wî tevlî hev bûye jî ew 'gurê boz' ku dizûre ji xwe re kiriye al û bi hawara faşîzma kesk a AKP'ê ve hatiye. Na, bila şaş neyê fêmkirin. Bi rastî jî gur heywanekî wisa ye ku ji zindiyên herî serbilind e. Hûn ê bêjin çima? Ji ber ku koletiyê nizane, serî natewîne... Lê belê dema ku bû sembola nijadperestiyê, dibe celadê gelê Kurd, gelê Ermen û heta gelê xwe bi xwe...
Em vê destana gurê boz û Bahçeli li vê derê bihêlin, werin li ser dest destaneke din: Şerê Hz. Îbrahîm û Nemrût... Mijar maarûf e, tê zanîn. Li vî welatî û heft aliyên cîhanê ti kesê nebihîstî û nizane tine. Werhasil, çarenûsa Nemrût jî wisa bi dawî dibe:
Li gorî hin rîwayetan, rojekê pêşiyek dikeve mejiyê Nemrûtê dijminê Hz. Îbrahîm. Ev pêşî xwe li wir jî nagire, digihîne mejiyê wî û jê re dibe êşeke neditî. Nemrût loqman hekîmên heftê û heft welatan banî ber lingê xwe dike ku jê re dermanekî peyda bikin. Ti kes jê re nabe çare. Di dawiya dawî de yek jê re rêyekê salox dide. Dibêje, "şivekî ji hesinî, baş bi hiriya pêz bipêçîne û pê li serê xwe bide da ku êşa serê te bibire". Nemrût wisa dike, êşa di serê wî de hinekê kêm dibe. Ji xwe re difikire û dibêje, "madem serê min wisa hinekê rehet bû, ez vê carê kilavê li ser şivik pêçandî rakim, dibe ku hê serê min rehetir bike." Bi rastî jî kilavê li ser şivê hesin pêçandî radike, destpêkê hêdî hêdî pê li serê xwe dide. Serê wî hineke dîtir rehêt dibê. Dê, dê, dê û dê... Dibîne ku serê wî xweş dibe. Ji nişka ve bi hemû hêza xwe, bi hesinî li serê xwe dide û aql û qeloxa serê xwe parçe parçe dike.
Gurê me yî boz (Bahçeli) jî ketiye vê ortalixê (meclisa mezin a Tirkiye) dibêje "Tirk neçar in ji Kurdan hez bikin, Kurd jî neçar in ji Tirkan hez bikin." Yê din (serokê CHP Özel) "Ka werin em Kurdan bikin xwediyê vê dewletê." Yan van hişê xwe xwariye yan jî wekî Nemrûtê rahmetî pêşiyek ketiye mejiyê wan. Na, hema em zû baweriya xwe bi van Nemrûtan neynin! Dibêje "dekûdolab û leystokên Osmanî xelas nabin!" Eger ne leyistok be, tê maneyê ku van mirina xwe di xewna xwe de dîtine. Yan jî pêşiyek ketibe mejiyê wan! Dibe, ev der Kurdistan e. Her der çem û kanî ne. Jê kêmtir jî avzem in. Tije pêşî ne. Ne stepên Asyaya Navîn in. Ma çi karê gur û çeqelan li vê derê heye?
Çima me şibandineke wisa kir? Lewra serokê İyi Partiyê di meclisa Tirkiyede êrîşê Bahçeli kir. Digot, "te berê bi benê îdamê qala Abdullah Ocalan dikir. Te pê nekarî. Te karîbû hêviyên miletê Tirk daliqanî." Û benê ku bi rastî jî, berê Bahçeli ji bo Rêber APO dihejand, avêt nav çavên wî.
Bahçeli çi kir? Ew benê serokê İyi Parti jê re avêtî, bir meqama xwe. Hûn ê bêjin çi jê kir? Bi odaya xwe ve kir. Wekî ku îdam bike (dihate wê maneyê) remza İyi Partî jî pê ve kiribû. Di rastiyê de yek ji yê din faşîstir e lê dibe ku pêşiyek (tirsek-fikarek) ketibe mejiyê wan.
Dîrokê careke din xwe dubare dikir, pêşiya ku bi hezaran sal berê ketibû serê Nemrût, ketibû Meclisa Mezin a Tirkiyê, ketibû nav mejiyê Bahçeli; hem jî di ber re dengê hesinî re ku ji TUSAŞ'a Enqereyê dihat.

---



# Luqman Xelîl: QSD'ê gel e, gel jî QSD'ê ye

**Endamê Fermandariya QSD'ê Luqman Xelîl diyar kir ku ew ê êrîşên dewleta Tirk ya dagirker bêbersiv nehêlin û di çarçoveya şerê gelê şoreşgerî de amadekariyeke mezin tê kirin. Herwiha Luqman Xelîl bi bîr xist ku êrîşên tên kirin têkbirina aramiya herêmê armanc digire.**

**Argêş Gewda/Qamişlo**

Derbarê êrişên dewleta Tirk ya dagirker yên li dijî herêmê, di heman demê de amadekariyên QSD'ê li hemberî van êrîşan, endamê Fermandariya QSD'ê Luqman Xelîl bersivê pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**- Hûn êrîşên dagirkeriya Tirk yên dawiyê çawa dinrxînin? Hêzên li pişt perdê ku piştgriyê didin van êrişan kî ne?**

Êrişên dagirkeriyê yên dawiyê cîhan giştî dişopîne. Ev aloziyên Rojhilata Navîn de diqewimin, dem dirêj e. Armanca hêzên metînger eve ku gelên herêmê mafên xwe yên mirovî bidest nexin. Êrişên ku niha li ser Libnanê di bin navê şerê Hizbûllah û Hemasê jî wê rastiyê dide berçavan. Di heman demê de, êrîşên li ser herêmên Rêveberiya Xweser ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî di bin gef û êrişên dewleta Tirk ya dagirker de pêk tên.
Giştî hêz hewil didin ku di axa Rojhilata Navîn de, serweriya xwe ava bikin. Yêk ji wan herêman Kurdistane. Di nav Kurdistanê de jî Rojavayê Kurdistanê ye. Ji ber ku axa Kurdistanê axekî dewlemende û deskeftîyên Kurda li Rojavayê Kurdistanê hatine bi dest xistin. Rêveberîya Xweser di wî milê de, pergala heyî napejirîne lê cuda ye. Ji ber wê tê armanckirin ji aliyê hêzên desthilat û hegemon ve. Niha di herêmê de, şerek bêpîvan û bêexlaq dimeşe. Dema Israil êrîşêkê wisa di hemberî gelê Filistînê dike, cîhan giştî di rabe ser lingan şermezar dikin. Teqeze em gelê cîhanê yê ku hemberî dagirkerîyê berxwe didin axa xwe diparêzin em wek QSD'ê piştgrî dikin. Lê dema mijar dibe Kurd cîhan hemu bêdeng dibe. Bi hezaran zarok û jinên Kurd berçavê cîhanê tên qetilkirin. Îsraîlê ruxmê ev hêza destê xwe de jî, dîjî Filistînê ev qas qetliam pêkneanîn e. Şerê niha axa Kurdistanê de dimeşe, ne di çarçoweya du artêşên ku dijminê hevin û hemberî hev enîyan de şer dikin de nîne. Ev êrîşên niha Dewleta Tirk pêktîne, êrîşên qirkirin û tunekirinê ye. Hewil didin îrade gel bişkênin û bidin rewandin. Hincetan wan êrîşan çîye? Tû gef li ser axa Rojavayê Kurdistanê û



Bakur Rojhilatê Sûriyê dijî dewleta Tirk nîne. Heya niha hêzên me, ti cara sînor derbas nekirine, dijî dewleta Tirk çalakî pêk ne anîne. Tû hincetên wisa ku dewleta Tirk ya dagirker beje em dikarin êrîş bikin nîne. Êrîşên ku tên kirin, armanc şikandina vîna gelê Kurd û têkbirina aramîya herêmê ye. Ji ber ku ev niha rewşa dewleta Tirk ya dagirker jîyan dike rewşa qeyran û alozîyê ye. Di aliyê kê de, çeteyên ku bi bajarên Rojavayê Kurdistanê dagirkirinê de piştgrî danî wan niha dîjî wan şer dikin. Aliyêkî din, şerê ku her 4 beşên Kurdistanê dijî Tevgera Azadiyê dimeşîne de têk çûye. Di heman demê de aborîya wê jî pir qels bûye. Desthilatiya AKP û MHP'ê êdî bîlî dagirkirina axê welatan tû tiştek destê wan da nema ye. Bi hevkirina hikûmeta Şamê ji bona piştgrîyê hev nekirin. Ev çeteyên ku niha herêmê dagirkirî de cih digirin zextê li ser wan ava dikin. Di wan êrîşên dawiyê pêkanîn de, piranî zarok û jin hatin armancgirtin. Armanca dewleta Tirk ya dagirker ne tene hêzên leşkerî ne, di heman demê de gelê sivîlê jî. Ev êrîşên bi balafirên bêmirov yên biçek pêk anîn de gorî ragihandinê 17 welatiyên sivîl şehîd bûn e. Hêjmarek zede jî birindar hene. Cihên ku tên armanckirin, cihê xizmetgûzariyê ne.

**- Amadekariyên QSD'ê li hemberî êrişan di çi astê de ne? Ger ku ev êrîş berdewam bikin dê bersiva QSD'ê çawa bibe?**

Em dikarin wê tiştê vekirî bêjin armanckirina gelê herêmê yê sivîl wek hêzên leşkerî QSD'ê di bin bingeha parastina rewa de, em bê bersiv nahêlin. Wek hêza QSD'ê me tedbîrên xwe yên ji bona êrîşeke mezin amadekirine. Li gor teknîka destê dewleta Tirk ya dagirker de em xwe amade hemû êrîşên bejahî û hewayî dikin. Tû hêza dewleta Tirk ya dagirker di bilî teknîka destê wê de nema ye. Ev jî, di tedbîrên pispor yê tecrûbeya şêrên dijî çeteyên DAIŞ'ê û hêzên çete yê girêdayî dewleta Tirk yê dagirker girtiye û pêşxistiye dikare xwe biparêz e. Dewleta Tirk wek berê ev teknîka destê xwe de nikare kar bîne. Ji ber ku dewleta Tirk ya dagirker pîvanên exlaqî û mirovî pere tûne ye. Tû zagonên ku navnetewî û zagonên xwe yên heyi jî binpê dike. Ev tecrûbeyên ku QSD'ê girtiyê aliyê leşkerî de yê salên dirêj e. Dibe hemû gel û hêzên me di hemû aliyan de hişyar bibin ku tû firsend û walatiyan nedin di



destê dagirkeran. Ger me rûxmê wê teknîkê hêzên me ev kas çalakî dikin û xwe di parêzên ev saya pakrewanên berxwedane û şehîd bûne ye. Gor ragihandinê jî, QSD'ê piştî wan êrîşan herêmên dagirkirî jî pir çalakiyên tolhildanê pêkanîn di bingeha parastina rewa de. ji bona parastina gelê xwe em li wirin, amadekariyên me hene û dê berdewam jî bikin.

**-Di çarçoveya şerê gelê şoreşgerî de di tekoşîn alîyê QSD'ê çawa bê meşandin?**

Heman demê de xala ku me di jorî de bal kişandîye li ser têkildarî şerê gelê şoreşgerî bû. Ji ber şervan û gel bi hevra tekoşînê dimeşînin. Civaka me û gelê me bi axa we girêdayî ye. Hestên welatparêzîyê di Rojavayê Kurdistanê de pir xurt e. Ev ji bona me cihê şanazî û serbilindîyê ye. Dema ku gelê me gel zarokên xwe keç û xortên Rojavayê Kurdistanê di hemû pêkhateyan pêktên de sengerên pêş cih digire, ev serkeftinekê mezin e. Her cihê ku êrîş li ser dihate kirin gelê me tevger dabû, diçu cihê bûyerê alikarî didan hêzên ewlekarîyê. Eve ji bona dagirkeran peyamekê pir girîng e. Gelê me hemberî hemû tûndiyan rihê şoreşgerane xwe birêxistin kiriy e. Em jî wek zarokên Rojavayê Kurdistanê QSD'ê ji bona parastina gele xwe bi hewra emê tekoşîn bikin.

**-Êrîşên ku heya niha pêk hatine de, ziyanên çêbû di çi astê dane?**

Me ev tişte gelek caran anî ser ziman, dewleta Tirk ya dagirker armanc girtina binesazîyên jiyana gele herêmê dixwaze bide rawestandin. Ji bona me wek hêz, em giranî didin şahadetên welatî û şervanên xwe. Tenê div an êrîşên demên dawî de pêk hatin gelek şervanên QSD'ê û gelê me yê welatparêz şahadetên pir giran bûha hatin jiyan kirin. Em dîsa ev pakrêvanên gehiştine asta şahadetê bibîrtînin. Wan qehremana mera mîrasek mezin hiştin. Weke din kargehên ku hatine bombe baran kirin, cihê xizmetguzarîyê ne. Tû eleqa ya xwe li gel hêzên me yên leşkerî tûne ye. Dewleta Tirk ya dagirker ragihandina xwe ya alîgir de, ev rastîyan berovajî dike. Di Dêrîke kargehekê mast û nexweşxaneyekê sîvîl û dirûngehek armanckir ev cihê leşkerî ne? Kiryarên ku dewleta Tirk pêk tîne, kiryarên dervî zagonî û terorî ne. Bi tû hinceta nikarin wê bidin pejirandin. Dixwaze weke herêmên ku dagirkiri ye Efrîn, Serêkanîyê û Girêspî jî, Bakur û Rojhilatê Sûriyê giştî dagir bike demografîya herêmê bide guhertin.

**- Herî dawiyê peyama we ji bo hêzên hevpeymanî yên ku li ser axa Sûriyê serwerin, çi ye?**

Êrîşên ku diqewimin, giştî hêzên ku Rojavayê Kurdistanê û Bakur û Rojhilatê Sûriyê de wek bin navê hevpeymana navnetewî de cih digirin bêdengin. Ev tê wê wateyê ku destura êrîşa hewayî sitandin e. Ji xwe hêzên wek DYA û Rûsya hevalbendên dewleta Tirk ya dagirkerin. Berjewendîyên xwe yên şexsî diparêzin. Pir cara wan hêzên ku tê qalkirin çira kesk dewleta Tirk ya dagirker re pêxistine. Dewleta Tirk dixwaze bejahî jî axa Rojavayê Kurdistanê dagir bike, lê rasta rast ji bona êrîşeke bejahî ya li ser heremê ne hate erê kirin. Lê lêdana balafirên bêmirov hate dayin. Pêwîste ev kiryarên dewleta Tirk re, bertek bê dayin. Hêzên wek DYA, Rûsya dewletên Ereban yên ku heznakin aramiya Bakur û Rojhilatê Sûriyê têk biçe, pêwiste bertêkên tund dijî wan kiryarên dagirkeriya Tirk bidin nîşandan. Gelê Bakurê Rojhilatê Sûriyê pêkhateyên cuda di şoreşa Rojavayê Kurdistanê ya ku 2011'an de pêk hatiye nawa aramiyeke mezin de jiyan dikirin. Ev hezdikin aramiya herêmê bidin xera kirin. Em ji wek QSD'ê çi êrîşên ku herêmê me û gelê me armanc digire bi bingeha parastina rewa de emê bê bersiv nehêlin.